# CÎ Û ROLA
# REWŞENBÎR Û HUNERMENDÊN KURD
# ÊN LI BAKURÊ KURDISTANÊ
# YA DI TÊKOŞÎNA AZADIYA KURDAN

GEL REWŞENBÎR Û HUNERMENDAN ÇAWA DINIRXÎNE?

**ANKET**

15-30 Mijdar 2025

**Lêkolînerê Sehayê**

**Suat OZALP**

***Ji bo armanc û rêbaza lêkolînê çend gotin,***


Vê xebata sehayê, di navbera 15-30 Mijdar 2025'an de, di der barê "Hunermen û Rewşenbîrên Kurd" de hat çêkirin. Vê xebatê bi armanca bê gelê li bakurê Kurdistanê dijiyin li ser cî û rola rewşenbîr û hunermendên Kurd ên li bakurê Kurdistanê ya di têkoşîna azadiyê ya Kurdan çawa dinirxînin derbixe holê hat kirin. Bi taybetî di van salên dawîn de, tevî têkoşîna azadiyê ya Kurdan, li Tirkiye û Kurdistanê, li derveyî qada siyasetê dorhêleke ku xwe wekî welatparêzên Kurd pênase dikin ên ji gelek qadên wekî sînema, tiyatro, muzîk, edebiyat, resim, fotograf, peyker, weşangerî, rojnamegerî û akademiyê yên wekî faaliyetên ronakbariyê tên hesibandin derket holê. Ferqa ji salên borî ev bû ku di serî de li Amedê, li gelek deveran têkîldarî van faaliyetên ronakbariyê sazî hatin vekirin.

Hevdîtin li bajarên Wan, Amed,Êlih, Mêrdîn (Qoser) û Riha (Wêranşarê) hatin kirin. Hemû hevdîtin bi rêbaza lêkolînê ya rû bi rû ya herî derbasdar û pêewle tê qebûlkirin pêk hatin. Hevdîtin bi 271 jin û 271 mêran, tevahî bi 542 kesan ve hat kirin. Nêviyê hevdîtinan li ciyê karên wan û nêviyê din jî li ser kolanê hatin kirin. Hemû beşdarên hevdîtinê ji berêvkê hatin hilbijartin. Ji bo beşdar newestin, anket (forma hevdîtinê) dirêj nehat girtin. Lewma jî hêjmara pirsan bi baldarî diyarkirin û tenê bi 30 pirsan hat sînorkirin. 6 pirsên ewil ji bo çawaniya beşdaran derxe holê pirsên demografîk bûn.


Li Tirkiyê, şîrketên lêkolînê ji bo rastiya xebatên anketorên xwe yên li sehayê saxlem bikin bê li gorî qaîdeyên lêkolînê tên kirin ya na, agahiya navnîşan û telefonê ji beşdaran dixwazin. Ji ber vê sedemê, gelek mirov ji ber sedema hin fikaran an beşdarî anketê nabin an beşdar bibin jî, fikrên xwe yên rasteqîn nabêjin. Lewma jî ji bo baweriya ji xebatê re zêdetir bibe ji beşdaran hîç agahiyeke şexsî ya ragihandinê nehatiye stendin.

Di xebatê de, hemû hevdîtin ji aliyê anketorekî ve hatiye pêkanîn. 30.12.2025


**Lêkolînerê sehayê Suat Ozalp**





Wekî di destpêkê de jî hatiye gotin, ankêt li 5 bajarên Kurdistanê hatine kirin. Li bajarên ji xeynî Amedê, xebata sehayê 2 rojan dewam kir. Di navbera van herdu rojan de, li her bajarî, heta ku ji destê me hat, me hevdîtin (anket) pêk anîn. Ji 542 hevdîtinên hatine kirin, 117 li Amedê, 112 li Mêrdînê, 109 li Rihayê, 104 li Wanê û 100 li Êlihê hatin kirin.





Dema xebatê, ji xeynî bajarên lê dijiyin bajarên ku jê hatine jî ji beşdaran hatiye pirsîn. Ji ber sedema ku anket li bajarên mezin hatiye pêkanîn, me texmîn dikir em li rastî beşdarên ji bajarên din werin. Wekî di grafîkê de jî tê dîtin, ji derveyî bajarên ku ankêt lê hatine kirin, rêjeyeke mezin a ji % 3.9 Colemêrgî derketin. Li Wan û Amedê em li tevahiya Colemêrgiyan rast hatin. Rêjeya kesên ku gotine em ji bajarên din ên Kurdistanê ne ji % 2.4 derket.





Di xebatê de, hejmara mêr û jinan wekî hev hatiye girtin.





Wekî di grafîkê de jî tê dîtin, her çiqasî ji bo navbera gelek temenan hevdîtin hatine kirin jî, rêjeya temsîlê ya navbera herî mezin a temen a anketê, ji rêjeya 14-34 a ciwanan pêk hatiye.





Ji ber sedema bi giranî ciwanan di xebatê de cî girtine, tevahiya mezûnên dibistana seretayî û hîndekariya seretayî ji mezûnên lîse û zanîngehê kêmtir mane. Rêjeya mezûnên lîsansa bilind di rêjeya ji %0,7 maye.





Li gorî Sendîkaya Türk-İşê mehek beriya vê xebata me diyar kiriye ku ya ku sînorê xizaniyê (92.547 TL) yê malbateke ji 4 kesan, tê dîtin ku hema hema ji %90'ê Kurdan feqîr in. Dema bê hesibandin ku li gorî normalê, di nava Kurdan de, rêjeya şêniyên malê zêde ye, bi rehetî em dikarin bêjin ku rêjeya feqîriyê ya Kurdan zêdetirê ji %90 e.





Dema li rewşa xebatê ya kesên di xebatê de cî girtinê bê nerîn, rêjeya herî bilind ji esnafan pêk tê. Pê re jî bi rêzê karker, bêkar, xwendekar û memûr li dû tên.





Vê pirsê, tekane pirsa berê wê vekirî ya vê xebatê bû. Di anketan de pirsên berê wan vekirî pirsên ku herî kêm tên bersivandin in. Di vê xebata me de, heman rewş xwe dubare dike. Wekî di grafîkê de jî tê dîtin, ji %39.7'ê beşdaran bersiv nedane vê pirsa me. Qismeke mezin ên ku bersiv dane jî navên muzîkjenan bilêv kirine. Navên kesên ji bilî muzîkê faaliyetên din ên ronakbariyê pêk tîn, ya hîç nehatine bilêvkirin yan jî bi qasî rêjeya % bê îfadekirin kêm hatiye bilêvkirin. Di vê xebatê de beşdaran navên hîç kesên ji qadên fotograf, peyker, sînema û weşangeriyê bi lêv nekirine.





Bi vê pirsê, diyardeya bingehîn a ku me dixwest em fêm bikin bê di hişê gel de dorhêleke hunermend û rewşenbîran a ji ji Tirkan bêrî bûne heye yan tuneye. Rêjeyeke mezin a beşdaran qebûl kirin ku di nava Kurdan de dorhêleke hunermend û rewşenbîr a aîdî wan heye.





Me vê pirsê ji bo ji xebatên me yên li pêş re seta daneyan çê bike pirsiye. Ji bo em bidin ber xebata ku paşê emê têkîlî rewşenbîr û hunermendan çê bikin, di vê xebatê de me cî da vê pirsê. Bi vê pirsê me daxwaz kir ku hîn bibin bê dewletê şîddet bêtir li rewşenbîr û hunermendan kiriye yan li gel. Bi qasî em dizanin, pirseke weha ji bo mexdûriya şîddeta ku dewletê li bakurê Kurdistanê pêk aniye nehatiye pirsîn. Li gorî van encaman, tabloyeke erjeng derdikeve holê ku dewletê her ji 4 Kurdan şîddet li Kurdekî pêk aniye.





Beşdaran herî zêde di têgihîştina vê pirsê de dijwarî kişandiye. Têgehên "Mêtingeh û mêtingerî" li gel di nîqaşên salên 80 û 90'î de têgehên herî zêde dihatin bikaranîn  bûn, bi taybetî di salên dawîn de ji ber sedema tevgera azadiyê ya Kurdan devjêberdana hedefa dewleta netewî ya serbixwe kiriye gotina xwe ya siyasî, di sehayê de me dîtiye ku gotin an jî têgeha mêtingeh bi taybetî di nav nivşên ciwan de maneya xwe wenda kiriye. Qismeke mezin a beşdaran her çiqasî ne bi têgeha mêtingehê be jî, qe nebe bawer dike ku rewşenbîr û hunermendên Kurd xwedîfikar in ku welatê wan di bin zordariyê de ye.





Di salên dawîn de, bi taybetî jî di medyaya civakî û qadên din ên çapemenî û weşangeriyê de, mijara daxwaza dewleta serbixwe ya Kurdan yek ji mijarên herî sereke yên nîqaşê ye. Li gel vê nîqaşê, nîqaşên wekî divê rêbazên têkoşîna demokratîk a legal an rêbazên leşkerî siyasî bên bikaranîn tên kirin. Ji ber vê sedemê, me daxwaz kir ku ji gel bipirsin bê vê mijarê ji aliyê rewşenbîr û hunermendan ve çawa tê dîtin. Vê pirsa li beramberî pirseka jortir me pirsiye, dibe ku beşdaran ev pirs hîn xweştir fam kirine, rêjeya daxwaza Kurdistaneke serbixwe ya rewşenbîr û hunermendên Kurd ji rêjeye pirsa berêtir a "welatê xwe wekî mêtingeh dibîne" bilindtir derketiye. Li gel rêjeya kesên ku bersiv nedane pirsa "welatê xwe wekî mêtingeh dibîne" ya ji %9, rêjeya kesên bersiv nedane pirsa "welatekî serbixwe dixwaze" di rêjeya ji %5.7 maye.





Di pirsên berê de, rêjeya welatê xwe wekî “serbixwe û mêtingeh” dibîne gelekî bilind bû. Lewma jî me du pirsên li ser rêbaza têkoşînê ya dema têkoşîna li dij mêtingeriyê û daxwaza dewleta serbixwe divê çi be pirsî. Di navbere encamên 2 pirsên berê û bersivên 2 pirsên paşê de, wê bê dîtin ku li gorî baweriya gelemperî ya heyî dijberî hene. Qismeke mezin a beşdaran li gel difikirin ku rewşenbîr û hunermend li aliyekî welatê xwe wekî metingeh dibînin û daxwazeke radîkal a wekî dewleteke serbixwe dikin, li aliyê din jî difikirin ku ew rêbeza têkoşîna sivîl a legal a zêdetirê wekî pasîf tê dîtin, ji rêbaza leşkerî bêtir dipejirînin.





Wekî li jorê jî me hewl da em diyar bikin, beşdar bi rêjeyeke zêdetir difikirin ku rewşenbîr û hunermendên Kurd rêbaza têkoşîna sivîl siyasî ji rêbaza leşkerî bêtir dipejirînin. Em bawer dikin ku li ser vê mijarê divê nîqaşên wêdetir bên kirin.




Beşdar difikirin ku hesasiya netewî ya rewşenbîr û hunermendên Kurd xurt e. Rêjeya beşdaran a dibêjin "tevlê dibim û bi misogerî tevlê dibim" ji %70 derbas dike. Rêjeya kesên dibêjin hestiyariya netewî ya rewşenbîr û hunermendên Kurd ne xurt e li dora ji %15 ye.





Li gorî bersivên vê pirsê, li gel ku beşdar asta polîtîk a rewşenbîr û hunermendên Kurd bi awayê berbiçav (%36,6) ne bes e dibînin, rêjeya kesên ku asta polîtîk bes e dibînin ji %43,9 e.





Bawer im ku vê pirsê pirsa herî krîtîk a xebata me ye. Di pirsên heta niha me pirsîne de, beşdar di der barê rewşenbîr û hunermendên Kurd de xwedî fikrên ku em dikarin bêjin


pozîtîf in bûn. Di pirsên din de jî, zêdtirê asta gotinê ya rewşenbîr û hunermedên Kurd dihat nirxandin. Vê pirsê, di rastiyê de, hewildayîna berbiçav a xebatên pratîk ên rewşenbîr û hunermendên Kurd tê nirxandin. Rêjeya kesên ku bersiva erênî dane vê pirsê hindik be jî di bin rêjeya kesên bersiva neyînî dane de maye.





Di vê pirsa me de beşdar bawer dikin ku rewşenbîr û hunermendên me ji paşverûtiyên me yên civakî bi temamî rizgar nebûne. Li gorî çavdêriyên me yên sehayê, beşdaran destnîşan kirin ku bi taybetî hin xuyên jiyanê yên hunermendan paşverû dibînin, dibêjin zêde guh nadin buyerên civakî, di gelek mijarên wekî malbat, eşîr, jin û hwd. de ferqa wan zêde ji ferqa kesên ji rêzê yên civakê tuneye. Wekî di grafîkê de jî tê dîtin, li gel rêjeya kesên bersiva erênî ya ji %31,8 dane, rêjeya ji %40,4 jî bersiva neyînî dane.





Wekî di vê grafîkê de tê dîtin, qismeke mezin a beşdaran destnîşan dikin ku eleqeya rewşenbîr û hunermendan bi siyasetê ve tuneye û tevî partiyên siyasî û siyasetmedaran hereketeke hevpar nakin.





Wekî di vê grafîkê de tê dîtin, li gel beşdar bawer dikin ku rewşenbîr û hunermendên Kurd li hundir hevkariya siyasetmedarên xwe nakin, heman rewşê li derve jî dewam dikin, bi saziyên pîşeyî yên navneteweyî yên heman xebatan dikin ve jî têkîliyan pêş ve nabin. Bi taybetî, tevî ku Kurdan piştî pêşdeçûnên li Rojava bala hemû dinyayê kişandibûn, deriyên cîhanê li beramberî pêşdeçûnên siyasî û dîplomasiyê, li rewşenbîr û hunermendên Kurd ve jî vebibûn. Em bêhêzbûna ku nikarin ji vî deriyî têkevin, wekî wendahiya mezin a Kurdan dibînin.





Mijareke din a ku beşdarên xebatê rewşenbîr û hunermendên Kurd qels dibînin têkîldarî kalîteya xebatên wan e. Her çiqasî di nava welat di nava rewşeke dezawantaj de dijiyin jî, bi taybetî dema derfetên rewşenbîr û hunermendên li diasporayê dijiyin tê bîrê, tê dîtin bi rêjeyeke bilind tînin ziman ku xebatên wan ne di kalîteya navneteweyî de ne.





Dema xebata li sehayê, rexneya sereke ya rasterast li rewşenbîr û hunermendên ku hat kirin ev bû ku dibêjin di nava gel û medyayê de xuya nakin. Li sehayê beriya dest bi pirsên anketên bikin, pirsa sereke ya ji bo hunermend û rewşenbîran dikirin ev bû ku digotin "kanî li ku ne". Dibêjin ji bilî xebatên wan ên medyaya sosyal peyameke wan a ji bo pirsgirêkên gel nedîtine. Ji ber vê encamê, wekî di grafîkê de jî eşkere tê dîtin, rewşenbîr û hunermendên Kurd di mijara diyarkirina rojeva Tirkiye û Kurdistanê de gelekî qels tên dîtin.





Bi vê pirsê, me daxwaz kiribû ku ji bo diyar bikin bê rewşenbîr û hunermendên Kurd bêyî dev ji heqaniyê berdin li dijî hemû zordestiyên civakî fêm bikin bê rastiyan di kîjan astê de diparêzin, di nezerê gelê Kurd de çawa tên dîtin. Di vê pirsê de, gelê Kurd aniye ziman ku hunermend û rewşenbîran bi rêjeyeke mezin qels dibîne. Wekî di grafîkê de jî tê dîtin, li gel rêjeya rewşenbîr û hunermendan bes dibînin ji %24 e, rêjeya ne bes dibînin a ji %52 gelekî bilind derketiye.





Tevî ku gelekî dişibe pirsa grafîka li jorê ya beriya vê pirsê, gel di vê pirsê de rewşenbîr û hunermendan gelekî qels dibînin. Piştî ku pirsa me ya di grafîkê de zelaltir hate îfadekirin, rêjeya ku rewşenbîr û hunermendan bes dibînin li dora ji %8 kêmtir derketiye. Nota zeîf daye parastina heqaniyê û nasnekirina qanûnên dewletê ya dema lazim a rewşenbîr û hunermendan. Di grafîka li jorê de, li gel rêjeya ku rewşenbîr û hunermendan bes dibînin ji %24 bû, di vê pirsê de rêje daketiye ji %16.2. Rêjeya ku rewşenbîr û hunermendan qels dibînin ji %52 derketiye %56.3.





Wekî ji grafîkê jî tê fêmkirin, gel rexneya ku qels in li rewşenbîr û hunermendên Kurd dike. Li gorî çavdêriyên me yên sehayê, gel destnîşan dike ku rewşenbîr û hunermendên Kurd bi taybetî jî wekî salên 90'î yên Apê Mûsa û vir ve, di nava têkoşînê de cî nagirin. Wekî di grafîka li pêş wê bê fêmkirin, bi taybetî jî dema dide ber siyasetmedarên Kurd, tê dîtin ku di nava têkoşînê de gelekî qels in.





Di vê pirsa ji bo rewşenbîr û hunermendên Kurd bidin ber siyasetmedaran me pirsiye de, bi ya me encameke gelekî dramatîk derdikeve holê. Bi taybetî di navbera operasyona li dijî siyasetmedarên Kurdan a ku di sala 2009'an dest pê kiriye û bi derbeya 15'yê Tîrmehê gihîştiye asta herî bilind de, zêdetirê 10 hezar siyasetmedarên Kurd hatin girtin û bi qasî vê hejmarê jî mecbûr bûn penaberên welatê xwe. Wekî berê jî min diyar kiribû, pirsa ewil a anketê ji bo gotina rewşenbîr û hunermendan bipîve hatiye pirsîn. Di van pirsan de, li gel beşdaran di der heqê rewşenbîr û hunermendan de baweriyên erênî îfade kiribûn, di pirsên li pêş ên ji bo pratîka rewşenbîr û hunermendan bipîvin de her tim bersivên neyînî dan. Di vê pirsê de nêzîkbûna xwe ya neyînî bi awayê herî zelal nîşan dan. Di pirsên berê de tevî ku rêjeya helwesta negatîf qasî nêviyê rêjeya helwesta pozîtîf dihat dayîn, di vê pirsê de helwesta neyînî hema hema derdikeve 10 qatên helwesta erênî. Bi vê encamê ve, gel destnîşan kiriye ku rewşenbîr û hunermendên Kurd di têkoşîna azadiyê ya Kurdan de bi gelekî li paş siyasetmedaran mane.





Di vî zemanê me de, li ser mijara divên rewşenbîr û hunermend di partiyên siyasî de bixebitin an nexebitin, car carê nîqaş tên kirin. Vê nîqaşê di nav Kurdan de jî heye. Di vê pirsa ji bo em diyar bikin bê gel vê nîqaşê çawa dibîne de, piraniya gel destnîşan kiriye ku rewşenbîr û hunermendên Kurd dikarin bibin endam an jî xebatkarên çi partiyeke Kurd. Bi ya min, piştî encama vê lêkolînê, divê rewşenbîr û hunermendên Kurd dûrahiya xwe ya ji siyasetê di ber çav re derbas bikin û têkîliyên xurttir bi siyaseta Kurdan ve girê bidin.





Yek ji pirsên herî girîng ên ankêta me, pirsa "qîmetê rewşenbîr û hunermendan ê li bal gelê Kurd" bû. Di vê pirsê de, piraniya gel bi rêjeya ji %71,1 destnîşan kirine ku rola rewşenbîr û hunermendan di avakirina civakê de girîng e. Di tu pirsên anketê de rêjeya "bi misogerî tevlê dibim" ewqasî bilind derneketibû. Li gel beşdaran bi piranî bersivên wekî "tevlê dibim, tevlê nabim û bi qismî tevlê dibim" dabûn, di vê pirsê de bersiva "bi misogerî tevlê dibim" ji %25,3 derket. Di vê pirsê de, bersiva "bi misogerî tevlê dibim" ji hemû bersivên "bi misogerî tevlê dibim" ên pirsên anketê zêdetir hat dayîn.




Me vê pirsê ji bo fêm bikin bê rewşenbîr û hunermendên Kurd çiqasî ji rewşenbîr û hunermendên netewa serdest bêrî bûne pirsiye. Qismekî mezin ê gel bawer dike ku rewşenbîr û hunermendên Kurdan rewşenbîr û hunermendên Tirkan teqlîd nakin û rengê xusletê wan ê xweser heye. Dîsa jî, wekî di grafîkê de tê dîtin, rêjeya kesên dibêjin rewşenbîr û hunermendên Kurdan di bin tesîra rewşenbîr û hunermendên Tirkan de dimînin, nîşan dide ku bi temamî ji vê rewşê rizgar nebûne. Ji %15,1'ê gel di vê mijarê de bawer dike ku rewşenbîr û hunermendên Kurdan rewşenbîr û hunermendên Tirkan teqlîd dikin û xusletê wan ê xweser tuneye. Her çiqasî rêjeya kesên dij difikirin 4 qatan ji vê rêjeyê zêdetir e jî, bi ya me, divê li ser vê mijarê bê sekinandin.




Mamoste Îsmaîl Beşîkçî ji salên dirêj ve ye, di vê mijarê de, rexneya herî mezin li rewşenbîr û hunermendên Kurdan dike. Me jî fikara gel a li ser vê mijarê meraq kir û di anketa xwe de cî da vê mijarê. Li gorî bersivên hatine dayîn, her çiqasî ferq biçûk e jî, hatiye destnîşankirin ku rewşenbîr û hunermendên Kurdan berjewendiya netewî li ser berjewendiya îdeolojîk digirin. Lewma jî divê bê gotin ku rewşenbîr û hunermendên Kurdan divên rêyeke gelekî dirêj bimeşin.




Li ser pirsgirêkên rojane tenê pirseke me heye. Me daxwaz kir em helwesta rewşenbîr û hunermendên Kurdan a li ser pêvajoya çareserî û aştiyê ya di van salên dawîn de wekî mijara li Tirkiye û Kurdistanê herî zêde tê axaftin, ji çavên gel bipîvîn. Mixabin, wekî bersivên pirsên me ji bo helwest û pratîka berbiçav pirsîbûn, bersivên neyînî di vê pirsê de jî der hatin. Qismeke mezin ê gel destnîşan kiriye ku rewşenbîr û hunermendên Kurdan di mijara sala dawîn a pêvajoya çareserî û aştiyê, di bicîanîna wezîfe û berpirsiyariya xwe de qels in.